



Foto: Nicolas Guy LENSENS / IKRK



Foto: Veysi Altay



SUCHDIENST

Gera navnetewî li endamên malbatê

Alîkariya ji bo lihevkomkirina malbatê

### Çîroka Semîra

Jiyana Semîra B.\* bi egerên şer, li welatê wê Îrakê, bi tevahî hat guhertin. Ew du car bûn ku mêrê wê bi sebareta siyasetê hatibû revandin. Piştî revandina sêyem, Semîra B. nûçe wergirt ku mêrê wê hatiye kuştin. Ev bûyera trajîdî hişt ku ew û bi zarokên xwe re koçberî Sûriya bibe. Ji wir, ew di çarçoveya çalakîyê wergirtinê ya mirovahî de gihîşt Almaniya.

Semîra B. ticaran hêviya xwe winda nekiribû ku hîn mêrê wê li jiyandê ye. Wê pêşî li ba Xaça Sor ya Almanî-Xizmeta gerê, daxwaza gerê pêşkêş kir, ji bo bi vê yekê agahiyên nû li ser mêrê xwe bigire. Di rastiyê de, piştî çend mehan nûçeyê ku barê wê sivik bike girt, mêrê wê piştî revandinê ji mirinê rizgar bûbû û li Bexdayê dijiya.

Xaça Sor ya Almanî-Xizmeta gerê niha piştgiriya Semîra B. dike, da ku malbatê li Almaniya dîsa bigihîne hev û bike yek. Lê ev daxwaz, bi kelemên qanûnî ku tê diyarkirin derfeta çareserkirina wan nîn e ket bin gefa têkçûnê. Piştî şêwirdariyê qanûnî hûr û kûr, Xaça Sor ya Almanî-Xizmeta gerê Semîra B. temî kir ku daxwaza penaberiyê li Almaniya bike. Ev daxwaz bi serkeftin hat cih. Bi vê rê cihê qanûnî yê Semîra B. bi awayekî biriyardêr baştir bû û derfet çêbû ku bikaribe mêrê xwe bê belgeyên zanîna zimanê almanî û hatina jiyandê ya misoger bîne Almaniya. Piştî çend heftiyên Semîra B. karibû dawiyê mêrê xwe li balefîrgehê pêşwaz bike.

\* Nav ji hêla weşanê ve hatiye guhertin

### Têkilî

#### Xaça Sor ya Almanî-Xizmeta gerê li nêzikî we



#### Derveyî herêmî

#### Gera navnetewî, nûçe û belge-namayan binçavkirinê yê Xaça Sor

DRK-Suchdienst  
Standort München  
Chiemgaustraße 109  
81549 München  
Telefon: 089 / 68 07 73 -111  
E-Mail: tracing@drk-suchdienst.de

#### Lihevciwandina malbatê


DRK-Suchdienst  
Standort Hamburg  
Amandastraße 72-74  
20357 Hamburg  
Telefon: 040 / 4 32 02 -221  
040 / 4 32 02 -176  
E-Mail: fz@drk-suchdienst.de

Agahiyên bêtir û rojname [www.drk-suchdienst.de](http://www.drk-suchdienst.de)



Foto: Mütigan Arpat

### Xizmeta gerê ya Xaça Sor ya Almanî



Xaça Sor ya Almanî beşek ji Xaça Sor ya Navnetewî û Teverga Heyva Sor e



Foto: Boris Heger / IKRK



Foto: Mijgan Arpat



Foto: IKRK

## Tiştên em dikin

### Gera malbatan

*We têtikiya bi xizmekî xwe re winda kiriye û hun nizanin ew li ku dimîne?*

Em li tevahiya dinyayê li mirovan digerin ku bi sedemên

- Şer û nakokiyên çekdarî
- Wêranî
- Rev û qewirandin
- Penaberî

Ji wan cuda bûne yan jî hatine veqetandin û windabûn û em çarenûsa wan zelal dikin.

*Hun dixwazin li malbata xwe di internetê de bigerin?*

Li [www.familylinks.icrc.org/europe](http://www.familylinks.icrc.org/europe) hun dikarin wêneyên mirovan bibînin ku ew jî li xizmên xwe digerin her weha hun dikarin wêneyên wan li wir biweşînin.

### Lihevciwandina malbatan

*Derfeta we nîn e hun têtikiyê bi malbata xwe re deynin?*

Em bi navê “Nûçeyên Xaça Sor”, li tevahiya cihanê, di navbera malbatên li herêmên dubendî û afatan de û xizmên wan li Almaniya têtikiyê deynin. Ev yek ji bo endamên malbatê ku ji hev cuda bûne tek derfet e ku bi hev re, di têtikiyê de bimînin.

## Tiştên em dikin

### Yekkirina malbatan

*Malbata we bi sedema şer, revê û qewirandinê li welatên cuda belav bûye? Hun dixwazin dîsa bi malbata xwe re bijîn?*

Em we şîret dikin û piştgiriya we ji bo hemî pirsên li ser lihevciwandina malbatê dikin.

- Şêwirmendiya li ser mercên qanûnî yên anîna malbatê ya derengî bo Almaniya.
- Piştgiriya bo kar û barên wergirtina vîsa.
- Navbeynkariya têtikiyan bi saziyên alîkariyê yên herêmî û navnetewî yên din re.

### Pêşkêşkirinên din: Belgenameyên binçavkirinê

*Pêdiviya we, ji bo karmendên almaniya bi belgenameyêke binçavkirina li welatekî din heye?*

Em alîkar in bo derxistina belgenameyên binçavkirinê li tevahiya cihanê. Eger di dema girtinê de, komîteya Xaça Sor ya Navnetewî serdana we kiribe, em dikarin hewl bidin da ku belgenameyêke li ser wê girtinê bi dest bixin.

## Çawa em kar dikin

### Em kî ne

- Em beşek ji tora xizmeta gerê ya navnetewî ne ku ji Komîta Xaça Sor ya Navnetewî û bi tevahî ji 189 Xaçên Sor yê Netewî û civakên Heyva Sor pêk tê.
- Li ser bingeha zagona bingehîn ya Xaça Sor ya Navnetewî û Tevera Heyva Sor em bêalî ne, dadmend in û cudahiyê nakin navbera komên dîni û netewî.
- Ji dehsalan û heta niha em di ser sînorên dewletan re malbatan dîsa digihînin hev.
- Em xwediyên serpêhatiyên gelek salan e, zanînen giştî yên bingehên qanûnî û têtikiyên binirx bi saziyan re.
- Agahî û danên li ser we û li ser kesê hun lê digerin bi baweriyeke kûr tîn parastin.
- Em rêxistineke alîkariyê serbixwe ne û tenê li ser daxwazên hun tînin ziman kar bi karmendên welat û derveyî welat re dikin.
- Xebata me belaş e (bêpere).